

HEJMAR
14

pîn

tir bi dînan dawet e!

%100
KURDÎ

KOVARA QERFÎ Û WÊJEYÎ



kovara qerfî û wêjeyî ji panzdeh rojan carekê derdikeve

16-30 nisan (avrîl) 2000

Sayı: 14

500.000 TL

ŞOVENİZMA FUTBOLÊ!..

E M S O V E N I Z M A

EWRÜPA..EWRÜPA
DENGÊ ME
BİBİHÎZE!..



BELAVKÊR...

Ka pêşin here ji xwe re çay an jî qehweke bîne, paşê hinekî bêhna xwe berde (*tu dikarî biçî deynê şeytên jî bidî*), bi kurtayı xwe rehet bike, peyre vê nivîs bixwîne. Ji bîr nekin, hûn serbest in, lewma dikarin her tiştî vexwin!. (Noşî can be an jî noşş!...)

Bi tenê hûn navê xêzkar û nivîskarêne me dibînin, lewma Pîne wekî xebata van kesan xuya dike. Lê "bargiranê" vê xebatê BELAVKARÊ me, zêde li ber çavê kesî nakevin. (Birêz nivîskamo! Xwelî li serê we be! Di Pîneyê de nivîsen ku herî zêde tenê ecibandin, ên xwendekar in. Xwendevan cara pêşin namedankê dixwînin. Kovara qerî, bû qehrî!) Ne tenê ji bo Pîneyê, di pêşketina ziman û çanda kurdî de rola Belavkaran gelekî bikêr û girîng e.

Hema bêjin, di defans û kaleye de ew malikê li xwe xera dikin, agir bi lingê wan dikeve, lê em ji bo ku golekî diavêjin, bi tenê navê me derdikeve pêş!. (Kuro zêde "şimarmîş" nebin ha! Em li vê derê pesna we didin, me nehêtikînîn. Hûn her tim li ser paparazziyê navxwe dipeyivin, hinekî li ser belavkirinê bipeyivin.)


Belavkar rojname û kovarê xwe hildigirin û berê xwe didin tax û malênen we. Di navê de hûn li quïka mişkan digerin, lê ew we li ezmanê heftan jî peyda dikin. Ji bîr nekin, belavkar her roj diçe sed cihan û heyâ ku pereyê xwe distîne, hûn îmana wî diçkînîn û di ser de jî dibêjin, ev qijnik ji ku derket!. (Kuro hûn jî cama dibin belavkêr! Yê ku Pîneyê nestîne, jîxwe ji emrê vî re çar tire keran mayel. Kî Pîne nestîne, bila Serpêhatiyê Sedsalê temaşe bike. Hawar e.. cara sedan e..)

Her wiha ji bîr nekin, pereyê wan zû bidinê. Ji ber zîm û zora navend û nûnergehan kevir û kuç bi halê wan digirîn, hûn jî di ser de li wan negirin. (Navend jî hinekî bi heq e! Ji ber ku hin belavkarê me bêrika xwe germ dikin û bi pereyê kovar an jî rojnameyê direvin İsvîçreyê!.. Xwedê hûn jî Engin Ciwan jî xedartir in!)


Ezê niha tiştîkî bêjim, lê ditirsim hûn ser û guhê me bixwin. Me ji bo ku Pîne bibe heftane dest bi xebatê kiriye. Lê dibe ku neçe serî. Piştî hejmara bîstan, ku lê hat, emê bikin heftane. Hûn jî pêşniyar ango zornîyarên xwe ji me re binivisîn!..



DOZO



Demîrel hê jî dibêje barê êzingê min!..



Ji ber ku polisan xortek ji ferîbotê avêtin
behrê 1.180.000 li wan hate birîn!..



**Li Dîlokê ji zarokên dewlemend û feqîran
sinifêن cihê vekirin!..**



Girtiyê
bi
navê
Engin
Huylu
ji bo
ku
nehate
tedawi
kirin
jiyana
xwe ji
dest
da!..


Emê gav bi gav mafê kurdan bidin!..

Ismail Cem (Wez'vê Karêñ Derve yê Tirkîyeyê)



FirFirok

Bülent
Morgök



Gotinê Pêşîyan

Bi gulekê bihar nayê.

(Bi lîrayekîjî dolar nayê û bi Xwedê 15 hezar mark zêdeyî qeweta min e; leşkerî balyeke têr don e. Gelo xêrxwazekîle ku bibe sponsorê leşkeriya min tuneyel..)

-Jin û mîr şer kir, bêaqil bawer kir.
(En ku şer kîrin pir biaqılıbûn?)

-Nivîşt ji kerê re nabe.
(Lewre maker jî ker e!)

-Bi derziyê bîr nayê vedan.
(Afferî ji te re, tu kûpê aqil 1, kes pê nizane!)

-Dijminê bavan, nabin dostê lawan.
(Aşti xewneke derewîn e!)

-Kalo nemir bihar tê, pîrê nemir pin-car tê.

(Cahît Mervan bi vê pîrsê Reha Muhtar perşan kir!)

-Kerê reş ci dizane bi qedrê gula ges.

(Tu jî bi qedrê kerbeşê nizanî mirov lawê mirov! Ku tu ker bûyayı, teyê bizaniya!)

-Kevirê havînê, biavêje kadînê.
(Mamoste Hesen Zinar dibêje na, ev gotin şas e, ne zanistî ye. Rastî ewe ku mirov kayê bavêje kadînê!)

-Rih dibe bost, dijmin nabe doşt.
(Gû di rihe we de!! Serokê Yekîtiya Koseyên Kurdistanê Aydin Bolkan.)

Nifirê keran:

-Xwedê heqê me ji Cegerxwîn re nehêle!

-Şêr şêr e ci jin e ci mîr e.

(Ev gotin ji aliyê giramatîk û lêkerîk û lokerîk ve şâsiyek şapehî derdixe holê, ez napejîrîhim û terwanbar dikim/Aşiq Samî Berbangidûşvar!)

-Her dar li ser koka xwe şîn tê.
(Derewîn ahakî bibin?!/Yekîtiya Darê Tamîjî yê herêma Serhedê)

-Dema ga ket kêr pir in.
(Bila neketa...)

-Mirov dar e cil star e.
(Şîv dolme be, ez mîvan im!)

BİR

Revhat Arslan





MAHMUD LEWENDI

NIZANE XWE LI ZANATIYÊ DATINÉ

Hin kes hene, di panel û semîneran de an jî di gotar û nîvîsên xwe de kêmasyîn xwe wekî yên civat, ziman û kultura millet nîşan didin.

Camêr baş bi kurdi nizane, dibêje "zimanê me têrê nale!"

Camêr baş bi kultura xwe nizane, dibêje "ev di kultura me de tuneye!"

Camêr baş bi edebiyata xwe nizane, dibêje "edebiyata me qels el!"

Hin tiştên ku bala min dikêşin

- Gelo **giyaxur** (vegetarian) çîma şîr û rûn û penîre heywanan dixwin?

- Kesên ku li dijî goştxuran in, çîma solêن çermîn dikin piyêن xwe?

- Gelo giyaxur an jî **goştnexur**, çîma guhdariya her cure def, dehol û erbaneyan dikin, ma qey nizanîn ku ew çem yê ci ye?

- Gelo **Komela Evîndarêن Heywanan** goş dixwin? An berhemên ku ji post û goş û çermê heywanan hatine çêkirin, bi kar tînin an na?

Û DU HELBEST

(Dixwazin bawer bikin û dixwazin nekin, bêyi ku ez careke din lê vejerim û kontrol bikim, ev herdu helbesten jêrîn, min di nav çar deqeyan de nîvîsin. Êdî hûn û şirove û yorim û komentarên xwe.)

ERÊ

Erê, erê

Berê xwe da ber bi ewrêن reş û tarî

Ne bi daxwazî, lê ji neçarî

Pêxwas û tazî

Tazî û birçî

Birçî û delyayî

Ne bêxwedî bû

Ne bêkes û bênas bû

Ne bêbext û bêwext bû

Lê bi wextê re rêk neket

Bext neda bi text

Lê wext pê re bêwext û bêbext derket

Derket

Û derket

Ji warê xwe

Berê xwe da

Ber bi ne-cîyan

Ber bi ne-waran

Ber bi ne-şûnan

Ber bi ne-welatan.

Ô NE ERÊ

Mêr dimire mîranî dimîne

Jin dimire zarok dimîne

Hesp dimire zîn dimîne

Ker dimire palan dimîne

Şâîr dimire dîwan dimîne

Mange dimire rêx dimîne

Zengîn dimire pere dimîne

Feqîr dimire deyn dimîne

Ez bimirim tiştek namîne!

HUSEYIN Û YÊN DIN

Nîvîskar: İMAM CİCİ
Xêzkar: ERTÜĞ SÖNMEZ



LOZIN



Haydar IŞIK

AXAYÊ DÊRSIM

Tevlo! Law law Elî Axa danî biwero, ma rê jî awa ci bimano". Na vaten Dêrsim de zêde ameya vaten. Begê kurdan û axayê kurdan tengayena milet de dîn û îmanê, namûs û vîjdanê xo û vatenê camêrdin her tim xo vîra kerdê. Eke ïnan ke tenê (heveyê) xover bidayê ewro ma bindestnâ Mo olilan de nêbiyê.

Axay benê top sone golê Xizir kemer (sî) erzenê gol û sond yenê sozê namûs danê, camêrdiye ser qisey kenê. Axayê ma xo çameno sonê dewi, hem qisanê xo û hem jî namûsê xo xo vîra menê. Na mesele her tim niya (wina) biya. Qetîlama Qoçgîr, Dêrsim, Pîran û Zîlan de jî niya biya, ferqê ci (xo) çînyo. Yezdan Şerî Kamuran Beg ra; Reyverî Seyit Rizay rê û Kasîmî jî Şêx Seîdi rê ïxanet kerd.

Dîroka mileta kurdan de Laj Pî rê û bira jî biray rê xayînî keno. Ewro Axayê Başûr **Mesut Barzanî** û **Neçîrvan Barzanî** yanê kak û kek biyê dişmenê mileta xo. Eke Artêşa Tîrk destanê xo dano jûwin ra zey cariyê ke oryantal dans kenê, vilê xo kenê derg lerzayina sonê Enqere. Axayanê niyanan de, iyê ke dişmenanê mileta kurdana dostûn bikirê, şeref û vîjdanê ïnan beno?

Ez dîroka Dêrsim rind nas kena. **Terteleyê Dêrsim** de heveyê Axay biyê ke hatê (kişta) dewlet giroto, zabutayanê tirkana birayın girota, heta ke dewlet kar û barê xo biqedîno, aşîrê ke şer kenê qir kerd û qedînera sire yeno birayanê bînan. Axayanê Çuxur ra vanê mayê şima rusne mi Rojhîlat koçê xo bar bikirê. Dima jî nezdiyê Mazgîrt de kokê ïnan anê.

Kam ke mileta xo ra kewt dûrî dişmenê ey zafê. Ewro Barzanî û birazayê ey Neçîrvan iyê karê qilîrinî kenê. Zey Axayanê Çuxur biyê birayê artêşa tîrk. Ezo bawer kena peynîa kiliha Barzanî ya bîbo zey axayanê Çuxure.

(...) "Ax derdi derdi/ Çuxure va derdi/ Axleru koçê xo bar kerdî/ Sonê verê kemerê Mazgîrdî/ Axir makiney qurmiş kerdî/ Ceney û cayîlê ma qîr kerdî. (...)"


Nika kam ke ame cayê qırkerdeni boyâ esensî yena ey. Axayê Çuxure biyê zaf dewlemendî.

Roj o ke min niwîsê xo nust, çarê aşma avrîbeli. Xojîvê mileta kurd bo ke Serok ame dinya. **Serokê Neteweyî** rê wêşîn wazena. Emrê ey derg bo.

(*) M. Çem, Tayê Kilamê Dêrsim

Xêzên Beredâzî


camerfiraxsho@hotmail.com



* Kovara JIYANA REW EN li benda xwendevanen xwe ye!

ELETIEWS

Sefer SELVİ



TARA
BÊJINGE

◆ CEMİL DENLİ

BEETHOVEN Ü ÇELEKÊN KURMANCE

Gelo, çelek çiqas ji muzikê hez dikan, hûn dizanin? Li gorî hin lêkolîn û ceribandinê zanyarên holendî, heywan ji muzikê hez dikan. Par, van zanyaran hin agahî dan li ser vê lêkolînê. Wan muzika klasik, bi çelekan dane guhdarîkirin. Di encamê de, li ber senfoniya 9'an a Beethoven û muzika hin kesen mîna wî, çelekan ji berê bêhtir şîr dan; heta %25'an. Ev yek dide nîşan ku:

- 1- Çelek jî xwedî hest û hîs in,
- 2- Ew jî ji muzikê fêm dikan,
- 3- Gava ku kêfa wan li cî be, laşê wan sererast dixebite,
- 4- Bandoreke erêni li ser aboriyê dike...

Li gorî vê yekê, encama ceribandineke, ku li tewlikeke gundekî Ewêna, li ser çelekên kurmancî û bi muzika kurdî pêk hatiye, li jêr e. Li gorî her muzikê, encameke cuda nîşan dide diyarde:

- 1- Stresa çelekan kêm bûye û hindiktir êm xwarine,
- 2- Zêde nekirine orîn,
- 3- A nebahnek (golika xwe qebûl nake), lê

nijaye,

- 4- Şîr, % (-3) heta 25'an zêde dane,
- 5- A ku kevanî pehîn dikir, nedîhişt ku wê oşe, ew hawê xwe terikandiye,
- 6- Golikê ku berê, ji mehê du kîlo zêde dikir, mehê 3.150 gr. zêde kiriye,
- 7- A stewr, hatiye ga, gon xwariye û avis maye.
- Li gorî Kîjan kasetê ci encam derdiye holê?**

Ciwan Haco: Li ber muzîka C. Haco

6.4;

Xelîl Xemgin: % 0. Çêlek gelekî dilsoj û ewat bûne û êm nexwarine. Ji ber vê yekê ne zêde, ne jî kêm bûye.

Şivan Perwer: % 17. 8;

Emînê Erbanî: % (-3) şîr kêm kirine. lek, gelekî reqisîne. Ji ber vê, hem fersend dîtine êm bixwin, hem jî êmê ku xwarine, zû dandine.


Kawîs Axa: % 24.03 şîr zêde kiriye. Çêleka wr hatiye ga, a nebahnek, li golika xwe bahaye û kevanî pehîn nekiriye. Eferim Kawîs al!

Koma Ciya, kasetâ bi navê Hûr nîmo,

Roja 1'ê: % 20.01

Roja 2'an: % 7. Li gorî çavdêrî û şiroveyên kolîneran, çêlek, roja yekê bi vê kasetê mest ne. Lî roja dudan jî, gava ku ceh dane wan, ji leva genim, çêlekan xwe wekî xapandî hesindine û pir li ber ketine.

A rast, divê mirov baş li kasetan guhdar bike bi himet bikire. Lewre çêleka ku li **Beytocan** ndar kiriye, golika xwe kuştiye!..




E-MAILÊN BELEDIYEYA AMEDÊ
-Heval ev zabiteyên hanê, ji pêvajoya nû qet fêm nakan!.. / **Ciwanen HADEP'**
-Hema we kurê min jî bixista îşki de, ma em jî ne kurmanc in!.. / **Xaltîka Zeyno**
-Ayağınızı denk alın!.. / **Derin Devlet**
-Sê berxên min winda bûne, gelo we nedîtine!..
Şivânê Bêdarê
-Abê bu işimiz ne oldi, üç aydır beklig!..
Cengoyê Qirix
-Hey başkanımlı!.. Me şereba Midyadê divê, zû bîşin!.. / **Ereqvexurên Suriçî**
-Silavân şoresgeri, netweteyî, welatparêzî û bijî!.. / **Teorizedeyen Paytextê**
-Ev konsera Ciwan Haco û Beytocan kengê ye malava!.. / **Evîndarê Ben û Senê**
-Me ferhengoka piñê divê, an na emê panzera bidin ber keviran!.. / **Zarokên Bağlar**
-Hawar hawar!.. Jina min dev ji min berda!
Hesenê Bêşewqe
-Jî me re cihekî vegetinîn, em li ser rê ne! / **Azadiya Welat**
-Sebra Xwedê bikşînin, hindik ma!.. / **Yekîtiya Ewîrûpâyê**
-Me hinek qeli û penir şandibû, gelo gîhîst destê we!.. / **Koçerên Herekolê**
-Başkanım, min bihîst ku hûn jî azeb in, jîxwe ez jî li parzerekî digeriym!.. / **Sorgula Bedewfiros**
-Ev memurên belediyeye edî rişwetî jî naxwin, ev ci biçim belediye ye! / **Sûka Göstfirosan**
Evdilê Koçer

Hesô Xêv

imam
cici






WERAR



(*) Demâku mezin büji, ji boku pê bike, bavê wî jê re pêlavêñ mezin standibûn!..



rengdér: sıfat rave: açıklamə peyt: ıspat
zexm: güclü du ta: iki misli tewekkili
bi tice çenî: parça Rêhesin: yo
pêwend: bağ, ilgi peng: lik
temara mirinê: ölüm uykusu
delav: yalak Hevşabûn: SEKS
erînî: olumlu neyînî: olumsuz



Her tişt ez im!..

Belediyeñ Hadepî dikan saleke li pey xwe oihelin. Di vê navberê de gelek tiştên ecêb û sosret qewimîn. **Pinepresse** rapora balkês û palekês a **Serokbelediyeñ Çarixliya Amedê Şefik Türk** bi dest xist. Em vê raporê wekî her car, dîsa, bêsansûr pêşkêşî ve dikan.

"Roja 18'ê Avrêlê ez li benda erebeya xwe ya meqamê sekinîm, ku were min ji mal hilgire û oibe belediyeñ. Lî mixabin nehat. Min jî di oiletên **otobosa belediyeñ** kirî û ez çûm, min mazbata xwe girt û ji wê derê jî, dîsa ez çûm belediyeñ. Min digot qey her kes li belediyeñ li nêviya min e. Lî dema ez gîhîstîm ber avahiya belediyeñ, min nihêrî ku tu qûlê xwedê li wê derê jî tune ye. Ez hinek qehîrm. Min di dilê xwe de digot, 'ez dê cezayekî bidime hemû karmend û karkerêñ vê belediyeñ.' Ji ber ku tu kes li holê tunebû. Çîma evqas dereng mabûn? Ez ketim nav avahiya belediyeñ, her der di nav toz û dûmanê de ye. Min gazî çend esnafan kir û min ji wan pîrsî;

-Ka li ku ne xebatkarêñ vê derê?

Esnafan ev bersiva bêtalîh û bêqeder dane min:
-Tu xebatkar û karmendêñ vê belediyeñ nîn in!

Min berê bi wan bawer nekir. Piştre min li nav dosyayen nihêrî ku ne xebatkarek û ne jî dosyayek heyel! Min ji paqîjîya avahiya belediyeñ dest bi kar kir. Piştre min ji xwe re çend cil û bergen zabita, îtfayecî û çopçiyân peyda kirin. Bi roj, bi cil û bergen zabiteyan digeriyan; ez bi gelek kesan re diketim nav galegalê. Agir bi malekê oïketa dibûm îtfayî. Piştre min çop berhev dikirin. Peyre jî wekî serokê belediyeñ min xelk dizewicand. Pişti demekê karê min ê bingehîn êdî çöbü zewicandin. Min ev pêşniyar li kesen dizewicin dikir.

-Li ser navê belediyeña Çarixliyê, ez lingê we dixim çaroxan û mala we mîrat dikim. Xwedê rûye we şâ ke, qedera min jî li ba kel..

Bî pêvajoya aşıtyî jî ji xwe karê bingehîn yê gelê Çarixliyê zewaca xelkê bû.

Karê Mazlum Dogan tune, bila ji bûk û zavê re i **Yekitiya Azebêñ Kurdistanê** klokey zêrê komara demokratik bişîne. Jîxwe ku ew bi xwe ji zo zewacê serî lêde, ezê hem lingê wî û hem jî serê wî li Çarixliyê bixime nav çaroxê... Lî ji ber ku azebiya niviskarên Pineyê Cemîl Denîlî û Rahmî Batûr, azebekî mezin dide gelê Çarixliyê, wekî serokê belediye ezê wan ji Azebiyê û me jî i vê ezaba Azebiya wan xelas bikim... Lî ji ber ku Cemîl Denîlî bêbextiyê li NÇM'ê dike, wê NÇM û daweta Cemîl Denîlî protesto bike û komên xwe neşne daweta wî. Lewma eme **Murat Kekili û Fatih Ürek** dawetî Çarixliyê bikin.

Bila bel.. Em dîsa vegerin ser karê belediyeñ. Min wekî zabita çend caran ji esnafan lêdan xwar. Pişti min çop berhev dikirin, êvarî, bi kêmeanî, min xwe li dora sê saetan dişust, lewre wiha bêhn ji min diçû. Heta ji ber bêhna çopê ez gelek caran neçüm kokteylen ku qeymeqam û leskeran dida. I ber wê jî ew gelek caran, ji ber neçûna min diqehîrîn.

Welhasil mesele ev e. Ev çend meh e ez li penda qadroyen memûriyetê me ku dewlet wan oïşîne. Tiştên ez nikarim bikim jî hebûn; wekî çekirina alsalt û parqan û hwd. Lî min qelend ji nolê rakir. Ev jî, wê di hilbijartînen pêsiya me de rey û dengen min gelekî zêde bike. Bimînin di nav xweşiyê de. Silav û humret.

*
Bersiva ku ji navenda partiya wî tê gelekî kurt e;
"Heval em te rexne dike. Ev xebat ji kolektivizmê dûr e. Te her tişt bi xwe ve girêdaye. Ev ne tarza me ye!"

Ew jî wisa lê vedigerîne:
-Heval rexneyen we di cih de ne, lê min her tişt bi xwe ve girêdaye, lewre ji xwe her tişt ez im. Ev xebat ji kolektivizmê dûr e, lê nêzî kolektivizmê ye. Lî ji niha û pê ve ezê her tişt bi we ve girêdim. Bimînin di nav girêkan de. Serkeftin..

Osman
ÖZÇELİK**SILAV Ü HURMET!..**

"Temaşevanê xoşewîst, em careke din di bernameya 'Hûrkolîn' de li gel hevdû ne. Me bêriya we kiribû, lê we?.. Spas ji yezdanê dilovan re ku em dîsa gîhîştin hevdû..." Pêşkêşkarê televizyonê, dest bi nasandina mîvanan xwe yên li studyoyê amadê bûn, kir. Ji mîvanan yek profesorê genetikê bû. Li ser cudatiya **ribonukleik asit** (RNA) û **desoxyribonukleik asit** (DNA) lêkolîn dikir. Yê din profesorê fizika atomê bû. Xebata wî, li ser dendika atomê û enerjiya elektronan bû. Profesorê din filolog bû û profesorê zaravayê Afrikaya Başûr bû.

Her pispor, li ser mijara xwe, xebat û dîtinên xwe, bi dûvedirêjî axivî. Piştî vê yekê temaşevan jî bi riya telefonê besdarî bernameyê bûn.

- Elo, elo kerem ke temaşevanê hêja!..
- Heval, ez ji Şermexê aramîs dikim. **Silav ü hurmet!** Ez beriya her tiştî silavê xwe ji gerîlayê serê çiyan, girtiyêng heps û zindanan û ji Serok Apo re dişnim!..

- Spas!.. Hûn dikarin dîtinên xwe ji me re bêjin? Fermo!

- Heval... welle ez hinekî heyecanlı me...
- Spas ji bo dîtinên we û telefona wel.. Ez bawer im niha li ser xeta telefona me temaşevaneke din heye... Elo, kerem kin, Fermo!

- Heval, ez Evdilayê Hecî Mecît im, ji gündê Gamîrî. Ez silav û hurmetê xwe sunmîs dikim. Ev serê sê salan e biraziyê min Hemo li wan deveran e. Heta îro carekê ji telefon nedaye me. Kuro Hemo! Dengê min tê? Ku te dengê min seh kir, telefonêkê bide me hey teres!..

- Spas ji bo telefona we.... Telefonike me ya din ji heye... Elo, kerem kin, hûn ji kîjan bajarî telefon dikan?

- Eloo! Heval dengê min tê wee! Heval, ez silav û hurmetê xwe ji girtiyêng heps û zindanan...
- Spas, spas! Hûn dikarin dîtinên xwe yên li ser zaravayê Afrikaya Başûr ji me re bêjin?

- Weh! Ez çawa nikarim!.. Ma ez Şêxmûsê Mistê me ku nikarim qonişmîs bibim. We got başûr? Haa, ji wî kurê **Mele Mistefa Berzanî** re bêjin, bila hişê xwe bide serê xwe, ma qey ew ne ji dola wî bavî ye kuro! Çîma hevalbendiya Teceyê dike?

- Me gotibû Afrikaya Başûr, ne **Kurdistanâ Başûr...** Dîsa ji ji bo dîtinên we spas, şevbaş... Niha telefonike din heye... Elo...

- Heval, şevbaş.... ez ji Xursê aramîs dikim. Xursa navê ha, ne ya din... ez, ez... Min ji bîr kir... Hah! Ez silav û hurmet... Va ye ez telefonê didim mîrê xwe. Ew çêtir bi van tiştan zane.

- Spas, spas! Şevbaş.. Telefonike din heye. Elo, elo! Fermo.

- Heval, şevbaş, silav û hurmet... Ez beriya her tiştî silavê xwe ji gerîlayê serê....

- Em ji silav û hurmet dikan. Kerem kin, dîtinên xwe bêjin.


- Welle ez ci bêjim heval. Cîranêne me hemû li vir hazir in. Em dixwazin hûn ji me re kilameke **Eyesê Şan** bibêjin.

- Ev bername ne ya kilaman e. Bernameya 'Hûrkolîn' bernameyeke zanistî ye!..

- De îcar zanist manist ci ye lo! Tu bi qedrê xwedê d iki, hûnê ji me re kilamekê bêjin...
- Spas ji bo agahiyêng we... Gelî temaşevanê birêz, em gîhîştin dawiya bernameya xwe. Bîmînin di xweşiyê del..

Bihar tu bi xêr hatî...

seref erol




VAYE BIHAR LI DAR E.
DINYA PIR XWESE!. JIYAN
Ü HIŞE MIN HEMIN ÜARAM E.
ANIHA MIN, TENE
BANQEK, BIHAR, TAV
Ü MASELANEKE XWESE!
SIR HEYE, BEXTEWAR,
ARAM, Ü BÊHNFIREH IM
TAV, BI NERMANE,
STÜKURA MIN GERM
DIKE JIYAN XWESE!
JI NIŞKE VE...




...KEGİKEKE
BEDEW LI CEM MIN
RÛNİST: KELA LI SERÊ
MIN RABÜ JI KËFA
BASK BI MIN VE HATIN,
LINGE MIN ERD
NEGIRTIN...


JI NIŞKE VE, WEKİ KU
HAT, LEXIST GÜ...
KEÇİKA BEDEWLI...



VA YE BIHAR LI DAR E.
DINYA PIR XWESE. JIYAN
Ü HIŞE MIN HEMIN ÜARAM E.
ANIHA, MIN BANQEK,
BIHAR, TAV Ü MASELANEKE
XWESE-SIR HEYE.
BEXTEWAR, ARAM Ü
BÊHNFIREH IM. TAV, BI
NERMANE, STÜKURA MIN
GERM DIKE. JIYAN
NE XWESE!. TU DIBÊ
QEY TIŞTEK KEME...

Qonans





"JANYA"

PENCEREYA PEYVÊ



◆ EHMED HUSEYNÎ

bo Rênas Jiyan, wiha dixuye ku em dê bi destê vî zimanî bêne kuştin.

"JANYA" ango cîhana helbestvan a ku li peyva pêşîn a zaroktiyê digire, da ku bihingive kîlîka herî dijwar a afirandinê û di heman kîlîkê de bikaribe kîlîka xwe ya taybetî, di çarçoweya herikîna demê de bi neynûk û diranan zeft bike.

"JANYA" ango bikaranîna cegerdar a xeyala mirovan û bicihkirina dastana sihr û amaje û sîber û lixwemikurhatina dîrokî ya gencîneya giyanên jibîrbûyî yên sirûd û dîlokên axê.

"JANYA" ango dengvedana şûr û mertalên şerbazên bêhûdeyiye û di meydana qirkirina xewn û xweziyan de, vedîtina laşê zimên û pîrozkirina helkehelka afsanewî ya derbirîna rasteqîne.

"JANYA" ango xwe-amadekirina ji bo çirandina çeperên peyvê û hewldana ji bo herifandina xelekîn asê yên şevistana dibistanê bajarvaniyê û xwekuştina ji bo bidestxistina rengên keskesorê û li ser eniya rojê nîgarkirina çend xêzên cihêreg ên azarkêşanê.

"JANYA" ango peyamên giyan û nameyên derengmayî û velerzîna demê û çavqerimîna dayikan û ber bi koristanan ve oxirkirina dilyar û xoşewîst û dilberan û di serdema mirina rengîn de, tevli-hevkirina mercen hebûna dar û ber û balende û bend û bîr û jibîrkirin û bêrikirinê.

"JANYA" ango govenda xewn û xwezî û arezû û dildarî û vegotina rewanbêjane ya êşê. Berhevkirina kîlîkên reviyayî yên hisê kurd û vewestana li ber termê nexşeya çiyan û bi bagera şînîgiriyê re, ragihandina peymanên serîhildana rondikên zuha yên pênuşa qederê.

"JANYA" ango biwatekirin û rêzgirtin û bejinbilindkirina zimên. Xweşik-kirina alavên derbirînê û parastina dîdariya peyva kurdî. Vekirina asoyan û rizgarkirina laşê kurmanciyê ji zixtên sextekar û keysperest û ji mîratgirê bêyad.

"JANYA" ango helbesta ku me ber bi hundirêne me ve radikişîne û şevçiraxa ku bîranînê avê ronî dike, dengê hestên birîndar ên şengebî û berûyan û hilperikîna serimest a tozê, ber bi tavsorka Birca Belek û bargehêne metirsiya gulaberoyê.

"JANYA" ango di vê reşbîniya sermedî ya peyva kurdî de, tovên hêviya jixwebawer û stêrkên vebîşirînê yên ku dê li ser lêvên zimanê me, dest bi govenda jîyanê bikin.

"JANYA" ango piştî xwepêşandan û xweberzkirina bêhûde ya nivîskarên sirguna bêreng, yekem madalyona li ser sînga çanda kurdî, li bakurê welêt û bersiva ji kevir a ku dê bi sedan pirs û lêpirsînan di cîhana me de vejîne.

"JANYA" ango pirsa êşa rastîn û derbirîna rastîn û şoreşa rastîn û dilsojiya rastîn û behremendiya rastîn û rastiya rastîn!..

Hamedank!

Kurdiya min bi pêş ket...

Hêvîdar im wê ev xebat bibe bê dawî. Hûn birînê gelê kurd pîne dîkin û mîzaha kurdan derdixin holê. Bi rastî ez bi Pîneyê geleki kêfxwes bûm. Piştî derketina Pîneyê ez bêhtir hînî zimanê kurdî bûm. Lî belê dîsa jî ez dizanim zimanê min ne ji hêla axaftinê û ne jî nivîsandinê ne sererast e. Gelek caran pîneyên bi tirkî dixim nav zimanê xwe. Ferhengoka Pîneyê geleki girîng e û ji aliye zimanê kurdî de gaveke dîrokî ye. Ez ji bo vê xebatê dîsa we geleki... pîroz dikim.

Pêşniyareñ min hene; a yekemîn, ez dibêjim bila Qirix bikeve pêvajoya aşitîyê. A duyemîn, di kovara Pîneyê de nivîs geleki pir in û karîkatur geleki hindik in. Ger min bizanîba karîkatur çêkirana, minê ji we re bişandana, lê nizanîm. Pînetof û Kermêş geleki xweş in.

Tunebûna Pîneyê ji bo me kurdan kêmasiyeke geleki mezin e. Pîne namûs û şerefa me xelas kir. Pîne derketiye meydanê/Ala berxwedana qerfi rakirya.

Qado Qoser/Zanîngeha Amedê

Ez ji 1 û 16 mehê hez dikim!

Berî her tiştî silavêñ xwe yên ku ji nav dil û gurçikên min ên germ têñ, ji we re bi rê dikim.

Eger ji min bipirsin "ka tu ji kîjan rojêñ mehê hez dikî?" Bersiva min wê bibe "1 û 16 mehê". Ji ber ku ez vê rojê dicim bayî û şeref û namûsa zimanê kurdî Pîneyê distînim. Dema ku PîNE dikeve destê min û ez wê dixwînim, hemû kul û xemêñ min diçin û ez xwe di nava ken û henekan de dibînim. Ji ber ku hûn kovareke evqas xweşik diafirînin, spasiya xwe ji xebatkarêñ Pîneyê re pêşkêş dikim.

Di vê pêvajoya ku em tê de ne, pêwîst e em xwedî li çand û zimanê xwe derkevin. Bi taybetî ji rola zimêñ, li ser çareserkirina pîrsîrêka kurdan geleki zêde ye. Ji bo wê jî, divê em xwedî li zimanê xwe derkevin. Bi xwendina Pîneyê, em dikarin zimanê xwe pêş bixin û li zimanê xwe xwedî derkevin.

Em dibêñ ku, kî li Pîneyê xwedî dernekeve û wê nexwîne, bila çanaxa wan bê dizîn.

Têbinî: Ev cara yekemîn e ku ez hest û ramanêñ xwe bi kurdî tînime zimêñ, lewma li şâsiyêñ min bîborin.

Nûrşan Polat / Manîsa

Silavêñ xwedê li we bin!..

Ev nivîsa min a yekemîn e ku ji kovar û rojnameyan re dişînim. Ev kêmasiya min e. Ezê bêjîm bidin xatirê zexeliya min. Lî belê ku hûn bêjin na, wê demê min bavêjin devê gur. Ma hûnê wan zexelêñ din bavêjin ku derê. Ez bawer im hûn jî nizanî!..

Di vê navberê de gelek xwendevanê Pîneyê dibêjin, "çîma hûn me nakanîn û me bi xêzen xwe didin ber fikirînê." Ez jî dibêjim: "Ma hûn nizanîn ku ken li para me kurdan neketiye, hûn radibin lomeyan ji Pîneyê re dikim."

Jinekê ji mîrê xwe lêdan xwar û bazda mala bavê xwe: "Bavo, mîrê vê jînê, li qîza te daye. Heyfa min jê hilîne!.."

Bavo li ser vê gotinê rabû ser xwe û sîleñ guvaşte rûyê keça xwe û gotê: "Here bêje mîrê xwe, wî li keça min da, min jî li jîna wî da. Bila bixwe îca!" Bawer im hûn nekenîyan, lî belê ji bo xatirê Pîneyê bikenin.

Şabetîn / Balikesir

Notayêñ muzîkê bi kurdî ne!

Piştî demeke kin dîsa ez dînîsim. Hindik mabû ez binivîsim, Pîne bi kurdî gîriyê merivan tîne. Lî ew ezmûna OSYMÊ derket û bi wê rûpela rengîn, kîfa me gelek xweş bû. Niha li cem min bo xurtkirina zimanê kurdî, xwediyê xebatêñ mezin, pîs-mamê Cemşît Bênder, zimanzan Mihemed Bênder heye. Ew tirkolox, kurdolox, filolox, dulox û alox e; loxen wî didomin, lî min hindik nivîsin.

Wî, ji we re çend kifşen nû amade kirine. Li ser muzîkê ye. Li gorî wî notayêñ muzîkê tev bi kurdî ne. Nebêjin çawa, bixwîñin û bibîñin.

Do: Bi dimîl 'dew', bi kurmancî roja derbasbûyî.

Re: Riya ku mirov tê diçe û dimeşe.

Mî: Heywanek e. (bi tirkî koyun)

Fa: Va ev peyva nîşane ye; va ez hatim.

Sol: şekal, pêlav. Mirov lingê xwe dispêre.

La: Peyva gazî kirinê ye . La ! Li min binêre.

Sî: Hejmara piştî 29'an e. An jî cihê tav nadê.

Abûzer Cotkar / Amed

Ez bi Pîneyê gûrûrlanmîş dibim!

Li qisûra min nenihêrin, gerek e ji zû de min ji faksek bisanda, lê hûn zanîn ülaşima (xwegihandin) Pîneyê zor e. Yek jî min nizanîbû Pîne derketiye. Ez niha li bajarê Tirkîyeyê Muglayê me; li nexweşxaneyê SSK'yê me. Ez jî bo birayê xwe refeqatîyê dikim. Ew jî silavan li we dike. Ew dibêjê, "Dema ez li bayî Pîneyê distînim, hemû li min dînihêrin, ez jî 'gûrûrlanmîş dibim (pêserbilîndbûn)' û dibîm tiştekî me yî wisa jî heye."

Qonans her bijî Qonans!. Te çavê qoriciya derxist. Hevalê Qonans an ji Hevalê İmam Cîci ji we hem xebatkaran ricayeke min heye, silav hurmetê min ji Wanê re bişînîn di Pîneyê de.

Girtiyê Azadiyê wekî şerekî ku di qefesa xwe hilnayê birîndar e, careke hêz dide xwe û dibêjê: Serhildan jî ya me ye/berxwedan jî ya me!. Lutfi Zemherî/ Necmedtin Qemberî/ Şewket Ewbekirî/ Tehsin Heşer



E.TİYARI

Dû Hêkîcê NewRoz'ê



pîne

KOVARA PANZDEROJİ (ONBEŞGÜNLÜK DERGİ)

- Xwedî (İmtiyaz Sahibi) M. Nuri KARAKOYUN
- Lijneya Weşané (Yayın Kurulu): Mazlûm Doçan, Doçan GÜZEL, İMAM CİCI
- Berpirşîyare Karîb Nîşaran
- (Yazı İşleri Müdürü) Abdurrahman PEKEĐIS
- Kargerî Gîsti (Genel Müdür) Seyîr KARABAŞ
- Rûpelsazî A. RAHMAN Çelik
- Navîşan (Yönetim Yeri) İsrîklî Cad. AYHAN İŞIK sokak. 19/1 Beyoğlu / İstanbul
- Tel: (212) 292 72 70
- Fax: (212) 251 95 85
- E-Mail: pinedank@hotmail.com
- Kargerî (İdare) (212) 251 79 37
- Çapxane: Yeni Asya Matbaacılık A.Ş.
- YAYIN KOORDİNAŞYON SES BASIN VE YAYINCILIK SAN. TIC. LTD.ŞTİ.
- Belavkirin BİRYAY Dağıtım
- Nûrgerhe Amedê Tel: (412) 223 34 83
- Swîd Tel: 46 86 52 34 29
- Swîre Tel: 41 76 334 34 74

AZADIYA WELAT Her şemî li bayîyan e!

Bixwîñin

Ên ku dibêjin kurdî ne ziman e biteqînîn!



B E Q Ên destê sibê hatine dinyê

Rexnegirênu ku ji rexneyan fêm nakin, komisyoneke rexneyan ava kiriye û van rojan bi zêd we 'eleştirmîş' dikan. Mixabin hinek rexneyen wan di cih de ne. Hün neteweyibûnê tifingki, şoresgeriyê narincokî û welatparêziyê ji wekî guleyekê dimesinîn. Dibêjin em kil bikin, kor dikan. Lé hün ji ser a xwe peya nabin!..

Q U Ş X A N E Ên berî nîvô...



Xoşewistên çardil, du rî li ber we ne: An hûnê ji projeyen nû, stratejiya şoreşa xwe, bi kîyarên xwe gav bi gav pêk bînin an ji di nava goristanen qarqar, gazindû şiroveyen binfil-i de, heta dawiya temenê xwe, hün nikarin kirêya xêni ji bidin. Serê we bi malbatê re ketiye belayê û hindik maye ku jina we ji ji dev we berde.

M O Z Ên piştî dana pez




Sedsala nû bi kîrî we nefat. Karê we baş nameşe. Di listikên toto-loتو û ker û makeran de ji tu tişt ji we re dernayê. Deynê we dane navê û ev du meh in ku hûn nikarin kirêya xêni ji bidin. Serê we maye ku jina we ji ji dev berde.

C A Ş I K Ên ber êvarê...



Hêstirên çavên we li ber wê stranê bûn lehî!... Ew strana ku hûn lê guhdarî dikan, dilê we zêde dişewitîne û we dibe diyaren dûr. Müzikâ wê stranê di nav giyana we de gundekî nû ava dike û hest û ramanen we vedijîne. Dilê xwe zêde neşewitînin, bîryara vegera welêt bidin û xwe ji vî derdi xilas bikin. (Lê min go delalê delalê, şerînê hevalê....)

Z I R N E Ên nîvê şevê...



Di nava geremolê de hûn zêde xwe digevizînin. Ev du sal in ku we rûyê xweşiyê nedîtû, lê ji bo we rojêna baş dest pê dikan. Van rojan hûnê herin devekerke dûr û hûnê dil bikevin keçeve porzer. Ji ber feodalîzm û xweper-estiya we, dê kecik dawiyê dev ji we berde; hûn Lewma hûnê bibin femînîsteke temam.

H U D H U D K Ên heft mehi hatine...



Em dizanin, karê we bas nameşe û hûn mane li benda mirovîn ku herin seyranê. Çiqas dikevin malan, lê hûn ji bili kîncen qirêj û pêlavên kevn tiştekî nabînin. Kovar û pirtükên ku hûn tînin ji, ji ber ku ne bi zimanê we ne, ne hûn dikarin bixwînîn û ne ji pere dikan. Lê dîsa ji navê we bûye 'dizê herêmê' û heta deh taxa bela bûye. (Navîşanen dewlemendant di destê me de hene, lê ji me re lazim in...)

Rojnameya otonom

KERMES

Xwişka Pîneyê

Hejmar: 5 Piştî Isa 2000 ④ Xwedî 0 tiştîn din: Welat Amedî (Li ser navê weşanxaneya T&T) ④ E-mail: nilamed@google.com



DEMIREL BÛ SEROKOMARÊ BAŞÛR

Hewlîr&Enqere/Ker-ha-

Piştî ku Demirel ji Meclîsa Tirk teskereya xwe stand û ji serokomariyê ket, niha ji dibe Serokomarê Başûrê Kurdistanê.

Li gorî ragihandina Ker-hayê peyman wiha hatiye girêdan: Piştî Demirel ji serokomariyê bû, rejîm kete nav tasewasê. Rêveberên Dewleta Tirk ji bo ku ji Demirel re serokomariyekî peyda bikin, dest bi xebatan kîrin. Pêşin Kîbris hate bîra wan. Lé Denktaş got, 'Erê em birayê hev in, lê ne şîrkê hev in, min bi zorê ji xwe re ev meqam zeft kiriye, qey ez ehmeq im dev jê berdim!'

Li ser vê yekê di serî de Makedonya, Bosna, Azerbaycan, Kirgîzistan, Baskirdistan, Özerk Yakut Cumhuriyeti, Nahcivan û gelek dewletên tirk hatin agahdarkirin. Lé ligel ruşvet û bertîlan ji, ji bo Demirel li tu deran serokomariyek vala nehate peydakirin.

Li ser vê y e k ê Dewleta Tirk heyeteke lêkolînê şand Latîn Amerika û Afrikayê, da ku pê bizanibin li wan deveran ji bo Demirel dewletên bêserokomar hene an na? Lé heyetê piştî stûyê xwe xurand û got, 'li wan deran siyasetmedar ji bo serokomariyê pê li stûyê hevûdu dikan.'

Paşê diyar bû ku dewleteke bêserokomar û serokomarekî/e ehmeq tuneye ku cihê xwe bide Demirel. Li ser vê yekê ji bo aşkirina Demirel çareyek hate dîtin û plan û proje hate gerandin.

Plan wiha ye: Demirel wê bibe serokomarê Dewleta Başûrê Kurdistanê. Ji bo vê yekê Serokwezîrê hikûmeta Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî çûye Enqereyê. Li vir bi wî re peymanek hate girêdan. Li gorî peymanê wê

li başûrê Kurdistanê

Türkmen ve Kürtmen Demokratik Cumhuriyeti' bê avakirin. Jîxwe çend sal emrê

Demirel heye, heta wê çaxê bila li wir bibe serokomar.

Li ser pêşniyazfermana E n q e r e y ê Nêçîrvan neçar maye û gotiye 'belê.' Lé Celal Talabanî r a z i nebûye û gotiye

'Demirel bi

kurdî nizane, li gorî destûra me kesek bi kurdî nizanibe, nikare bibe serokomar.' Demirel piştî ku dema wî li Enqere temam bibe, tevî Nazmiye Xanim wê li Sîlopiyê li qantirekî siwar bibe û derbasî başûrê Kurdistanê bibe.

**Kermêşyal**

Kermêşen hêja, ev du hejmar in, ji ber sedemên ku Pineçyan xwestin bikevin nav sînorên me yê otonom, şerek di nava me de qewimî û em ji we dûr ketin. Lé piştî ku Neteweyen Yekbûyi û KNK'ê bû qasid, em li hev hatin.

Ger ku hûn me li vî quncîkî nebînin, bizanibin ku komploya Pîne li dar e. Hingê dawa Kermêşê ji wan bikin, hewl û hêza me heye ku em heta hetayê bi we re bin. Bes ku Beko û Pîne li dijî me nekevin nav tîfaqê. Kermêş ji bo we heye. Kermêşen we zêde bin! Ji bo rexne, pesn û çêrên we, e-maila me li jor e.

-Tiştîn nû:

-Pirtîka Faysal Dagli a bi navê "Uzak Yazilar" ji Weşanen Mezopotamyayê derket. -Pirtîka Şenf Kaplan a bi navê 'Ölüm, Öyle Ürkük Bakma' ji Weşanen Reşvînê derket. -Karl May, 'Vahsi Kurdistana Yolculuk' edî bi tirkî tê xwendin. Wergera wê ji Weşanen Mezopotamyayê derket.

BIRAHÎMÊ SEGÊ Û HEFT KURÊN KASÜLÎ

Birahîmê Segê, di nava civaka Torian de hinekî xwedî tir û kopana Batmanî bû û heft kurên wî yên gemboreyi hebûn. Her heft ji mîna golikên li serê tingan cîndirk didan, heya êvarê li ber berberojojkên serê baniyan rûdiniştin û tir û kopana xwe dinepixandin. Her sev, di ser sîvî de ji, zimanê bêhestî ku di şikefta devê wan de dibû palêwan, gotin û galgalên ji xwe mezintir dikirin rîz:

Yekî digot, 'Yabo, sibe zû dêl min bike, ezê biçim daran'... Yê din, 'Yabo, sibe zû min şîyar bike, ezê biçim cot.' Yê din ji xwe kêm ne dikir, digot, 'Yabo ji kerema xwe dêl min ji bike, ezê biçim nav rezan.' Yê çaremîn ji digot, 'Yabo dêl min ji bike, ezê biçim nav werza.' Yê pêncemîn, 'Yabo, ez ji dixwazim biçim avdanê, dêl min ji bike.' Yê sesemîn, 'Yabo, ez ji dixwazim biçim tevrîkê, hinekî eşefê bikim.' Yê heftemîn, 'Yabo, min ji şîyar bike, ezê biçim teyarê mer bidim.'

Her heft tiralên malê heya nîvê şevê digot û dibeland.

Kêfa Birahîmê Segê dihat, di dilê xwe de digot:

-Xwedî dizane ku namûs di serê her heft kurên min geriye, wê biçin kar, ez û pîrequta dayika wan ji karûbar xelas bibin.

Ji kîf û dilxwesiyê xew ne dikete çavên wî, sibehê berî ku mela qirika xwe ziwa bike û bêje Allahûekber, çû ber serê kurê mezin dêlê kir. Kurê mezin di nava xilmâşıya xewê de got, 'Oooh toooo, xewa min tê, ezê sibe biçim.'

Birahîmê Segê bibez çû ber serê kurê duymîn, dêlê kir. Kurê duymîn ji xwe di nava nîvîn de bi ser hev de guvaşt û got:

-Yabo ma rojê xwedê xelas bûne, sibe ezê biçim...

Birahîmê ber bi kurê sîyemîn ve beziya û dêlê kir...

Kurê sîyemîn ji xwe di nava cihan de veziland û turxuland:

-Yabo, sibe ezê biçim, ôro ne hawar e, sibe ezê biçim ser kar.

Bav ber bi kurê çaremîn beziya, milen wî hejandin. Kurê çaremîn ji xwe vermitand û got:

-Xewa min tê, ezê sibe biçim.

Mûrê Birahîmê Segê şikestin, lê çû ber serê kurê pêncemîn, dêlê kir. Wî ji mîna yê din gotin di nava diranen xwe de perciqandin û got, sibe...

Axir, her heft kurê Birahîmê Segê, bi heman temtîlê mîhêne kîrin û gotin, 'sibe tê xêr pê re, hawar ne li dûr me ye, emê sibe biçin kar'

Karûbarê Birahîmê Segê û her heft kurên kasüllî ev bû. Evarê li ser sîvî karê sibe li hev parve dikirin û heya nîvê şevê digotin û dibelandin; emê halo bikin, emê wiha kar bikin û piştî nîvê şevê pix dikirin xewa şerîn. Birahîmê Segê ji, bêrawestan, her sibe berî azana mele, diçû yeko yeko li ber serê wan disekinî, û qaşo ew şîyar dikirin.

Dawî dilê Birahîm di nava guvaştineke mûr sikestî de, ber bi pîrequta xwe diçû û digot; 'Rabe xatûn, bar li ser milen me ye'

Careya Birahîmê Segê heya roja dawî ku çavê xwe girtin, ji hewata cîhan gewrik bê par ma, nehate guhertin. Di nava bêkariya keskûliya xizanî de ma... İcar, kî ji pirpêjîn zanayen me kurdan çarenûsiya Birahîmê Segê û heft kurên kasüllî digire ser xwe, azad e... Pesindariya pirbêjî û kasûliya nepêjî, mîna şîr û berê dayika wan li wan helal û zelal be.. Mirovîn hêja eger tu nedê kedê, tu nastîne medê...

Medeni FERHO

Îbrahîm Ehmed

XWA HAFIZ !

Xwa Hafiz
Mamostecan!..

Te her dem "JANA GEL" anî ser zimên. Te serdemên girîngtirîn ên dîroka nêzîk a kur-dan bi çavê serê xwe dîtin! Ji Komara Mehabadê heya Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê KNK'ê te ji bo têkoşîna rîz-garîxwaz a neteweyî xebat kir.

Silavê me li Ehmedê Xanî, Hecî Qadirê Koyî, Mîr Bedirxan, Mele Selîm, Şêx Seîd, Elîşer, Şêx Mehîmûd Berzencî, Îhsan Nûrî Paşa, Seyîd Rîza, Simko, Qazî Mihemed, Hêmin, Hejar, Nûrî Dêrsimî, Mele Mistefa Barzanî, Leyla Qasim, Qasimlo, Mazlûm Dogan, Kemal Pîr, Necmettin Büyükkaya, Cegerxwîn, Osman Sebrî, Şehîd Aram, Mahsûn Korkmaz, Mûsa Anter, Zîlanê bike!..

